

# Çîrokêñ Rovîyan

*Berhevkar:*  
Rênas Xendekî



WEQFA  
MEZOPOTAMYAYÊ

**Rênas Xendekî**, di kanûna paşîn a 1994an da li gundê Xendekê yê bi ser Hezexê ve ji dayik bû. Li Zanîngeha Dîcleyê Beşa Hiqûqê xelas kir. Parêzer e, li Cizîrê dimîne û karê berhevkarîyê dike.

**Pirtûkên wî:**

Mamikên Botanê, (Rênas Xendekî-Dildar Botî, Weşanên Wardozê, Mamik, 2017)

Folklora Roja Nûyê (Rênas Xendekî, Weşanên Wardozê, 2018)

## Naverok

- Pêşgotin / 7  
Rovî, kîso, aşvan, ker û bûk / 11  
Rovî, kew û dîk / 13  
Rovî û jina wî / 15  
Meseleya Osman Efendî, rovî, şêr û kîso / 16  
Rovî, dîk û tajî / 19  
Şerîeta rovî, mar û cotyar / 21  
Şirîeta rovî, zilam û mar / 24  
Ev ne vijika henekan e / 25  
Destûbiratîya rêvî û hirçê / 26  
Rovî, pîrê, kerê pîrê û dûvê rovî / 28  
Rêvî û pîrê I / 30  
Destûbiratîya rêvî, gur û şêr / 31  
Rêvî û kîso / 32  
Rêvî, hirç û cotkar / 34  
Rovî û hirç I / 37  
Rovî û mar / 37  
Dîklîko Derpîspîko / 38  
Rovî, gur û mehîn / 41  
Rovî û mirîşk / 44  
Rovî û pîrê II / 47  
Rovîyê çîyê û yê deştê / 49  
Rovî û hirç II / 52  
Rovî û şêr I / 53  
Rovî û qijak / 55  
Mam rovî û meta hirç / 56  
Rovî, şêr û gur / 58  
Rovî û şêr II / 59  
Rovî û gur / 60  
Rovî û quling I / 63  
Rêvî û quling II / 64

- Rovî û quling III / 66  
Rovî, gur û şeytan / 72  
Rovî, dîk, kew û ordek / 77  
Kuna mam rovî / 85  
Rêvî, gur, wehş û kêvroşk / 87  
Rêvî û dîk / 89  
Rêvî, şêr û bombe / 90  
Jîyana Zarbêjan / 91

## Pêşgotin

Di vê pirtûka li ber destê we da, tenê çîrokên rovîyan hene. Me komeka folklorhez demeka dirêj di bin banê Weqfa Mezopotamyayê da perwerdeya folklor û berhevkarîyê wergirt. Piştî vê perwerdeyê divê her besdarekî/ê xebatek pêşkêşî Weqfê bikira. Di vê çarçoveyê da me jî li herêma Botanê -bêhtir li Cizîra Botanê- dest bi berhevkarîyê kir. Me dît ku di destê me da gelek çîrokên rovîyan berhev bûn, li ser vê yekê me biryara amadekirina dosyeya çîrokên rovîyan da.

Di vê xebatê da, ji bilî 8 çîrokan -ku ev her heşt jî li Mêrdînê hatine berhevkirin- tevahîya çîrokan li herêma Botanê hatine berhevkirin. Dîsa ji herêma Botanê jî bêhtir li Cizîra Botanê hatine berhevkirin. Ji bilî 3 çîrokan -Ev her sê çîrok, ji alîyê Roza Sierrayê ve hatine berhevkirin û bi destûra wê di vê xebatê da hatine bicihkirin- hemû çîrok ji alîyê me ve hatine qeydkirin. Dîsa deşîfrasyona hemû çîrokan ji alîyê me ve hatîye kirin. Vê pêvajoyê sê salan dom kirîye. Zarbêjên çîrokan, piranî kesên temenê wan zêde ne. Di nava zarbêjan da jin û mîr hene û piranîya zarbêjan nexwende ne. Dîsa du çîrok bi awayê stranê hatine gotin, ji bo ev awayê cuda jî bê dîtin me ev her du çîrokên stranî-helbestî li vê xebatê zêde kirin. Ji bilî vê jî di “Meseleya Osman Efendî”yê da mijareka dîrokî û rastîn hatîye gotin, ji bo ev mesele bê gotin di hundirê meseleyê da çîrokeka rovîyî hatîye gotin û me cih da vê çîrokê jî.

Wekî tê zanîn rovî ajelekî bi fen û huner e. Ji ber ku ajelekî ne zêde bihêz e bi awayekî xwezayî ji bo parastina xwe hînî fen, dek û dolaban bûye. Rovîyî wekî ajel xwe ji mirovan dûr nexistîye û ew li dora cihûwarên mirovan jîyaye. Ji ber vê hindê, gelek caran bi mirovan ra rû bi rû bûye. Gelek caran ketîye lîstikên

mirovan, gelek caran bermayîyêñ mirovan xwarine û gelek caran jî ketîye nava dehl û rezê mirovan. Bi van lihevketinan, mirovan gelek çîrok li ser rovîyan gotine. Ev yek hem di lîteratûra cîhanê da heye hem jî di folklorâ kurdan da heye. Mirov destê xwe li derîyê kê bide hema bibêje her kes dikare çîrokeka rovîyan bibêje. Ji ber ku têkilîyêñ mirovan û rovîyan xurt bûne, rovî jî ajeleke bi fen û huner e, mirovan hem jê hez kirine hem jî mirov jê aciz bûne. Ev yek di çîrokan da jî dixuye. Di çîrokên vê xebatê da em dibînin mirov bi navê “Mamê Rovî” bang lê dikan. Dîsa mirov qebûl dikan ku rovî biaqil û jîr e. Bi vî aqilê xwe hem dikare lîstikan bîne serê mirovan hem jî bîne serê ajelêñ dîtir. Ev ajel wekî “rovî, rûvî, rêvî...” tê binavkirin, loma me nav wekî gotinê hiştin.

Bi vê xebatê, me xwest em cihê “Mamê Rovî” li koçka folklorâ kurdî xweştir bikin. Hêvî dikim bigihîje meqseda xwe. Di dawîya gotina xwe da jî ez dixwazim yeko yeko malawahîyê li hemû zarbêjêñ xwe bikim ku bi camêrî û canikî dema xwe dan û ev çîrokên giranbiha ji me ra gotin.

Dîyarî ye ji bo dê û bavê min; Gurîyê Xelîlê Ebo û Sedîya Ehmedê Hacî Isa.

Rênas Xendekî  
Cizîr